

Pêşketina zarokên we di

# Pêşdibistanê de

SOLLENTUNA KOMMUN

www.sollentuna.se



## Hînbûna zarokan ji dema pêşdibistanê da dest pê dike

**Em di navenda xwe de di pêşdibistanê de perwerdeya zimên, matematîk, zanist û alavên dicîtal di qalibê yariyê de demeşînin. Bi sazkirina peywendiyan bi rêbazên cûrbicûr  wekî wêne, şikl, mûzîk, stran, şano û tevgerên cûbicûr zarok vê derfetê bi dest dixe da ku hawirdora xwe baş şirove bikin. Bi dengê bilind xwendina pirtûkan ji bo zarokan û pişt re bi hev re niqaşkirin tê vê wateyê ku asta bêje û hêza texeyula zarokan di hawirdoreka hêmin û perwedehî de dikemile.**

### Hînbûn di dema pêşdibistanê de

Dewreya pêşdibistanê divê ji bo hemî zarokan cihekî şahîk û mijûl, hêmin û perwerdehî be. Li vir em peywendiyan bi rêbazên cûrbicûr bi yarî, matematîk, zanist û alavên dicîtal dimeşînin.

Meraq û xwestina hînbûnê di cihê ku perwerde li ser mihwera yarîyê pêk tê esasa kar in. Di dewreya pêşdibistanê, zarok bi alîkariya amûr û rêbazên cûrbicûr şiyana çêkirin, darêştin û afirandinê hene.

### Perwerde di pêşdibistanê de divê:

- Afrînerî, meraq û xwerêzgirtina zarokan pêş bixîne.
- Alîkariyê bide zarokan ku yekdilî û nigeranbûn ji bo hevdu di rihê wan de saz bike.
- Girîngiya kemilîn û geşbûna payîdar li zarokan hîn bike.
- Esas û bingeha têgihîştina zarokan ji demokrasiyê ava bike.
- Têgihîştineke berfireh li ser ciyawaziyê bide zarokan.
- Zarokan hînî mafê mirovan bike.

**Armancên dewreya pêşdibistanî di şaredariya Sollentuna:**

- Çawaniya perwerdehiya berz: Pêşdibistanî divê bingeh û esasa hînbûna heta hetayî pêk bîne. Li vir zarok her roj di hawirdorekê de perwerde dibînin ku çavdêrî, kemilîn û hînbûn tê de ekîd e.

- Misogeriya ewlekariyê: Hemî zarok di pêşdibistanê de divê asayîşê hest bikin.

**Geşkirina şarezayiya zimanî li bal hevdu**

Di pêşdibistanê de, zarokên we tevî zarokên din û amojkarên hêja dikemilin û ruşd dikin û perwerde dibin. Her wiha me dê bi we re wek serperiştê/a zarokên we alîkariyek nêzîk hebe. Di pêşdibistanê de ji bo zarokên we hin derfetan çêbikin ta ku bikaribin bi zimanê swêdî biaxifin û jê têbigihên. Hûn wek serpeiştê zarokan dikarin bi zimanê ku di hundirê malê de diaxivin bi zarokên xwe re biaxivin û ji bo wan pirtûkan bixwînin. Bi hev re alîkariyê bidin zarokên we ta ku şarezatiya zimanî ya xwe pêş bixin û geş bikin!



**Gelo we dizanibû ku:**

- Zarokên ku çûne pêşdibistaniyê, çaxê dest bi dibistanê dikin ji hêla zanistî ve di asteke bilind de ne.

- Zarokên ku zimanê wan ê dayîkî ne swêdî ye ev derfeta wan heye ku di pêşdibistanê de xwe hem di zimanê swêdî de hem jî di zimanê xwe ya dayîkî de pêş bixin.

**Bi dengê bilind xwendin taybetmendiyeka xwezayî ye**

Di pêşdibistanê de, em piranî bi dengê bilind ji bo zarokan dixwînin. Dema ku li ser pirtûka ku me xwendiye diaxivin, zarok dikarin tecrubeyên nû bi dest bînin. Zarok bi alîkariya heval û amojkaran nêrînên xwe berfirehtir û geştir bikin.

Ew hizir, bilêvkirin û firehiya bêjeyên xwe pêş dixin û xurtir dikin. Her wiha şiyana bizimananîna ramanên xwe di zarokan de xurt dibe.

**Gelo dixwazin zêdetir bixwînin?**

Hûn dikarin serî li malpera pêşdibistana şaredariya Sollentunayê bidin: www.sollentuna.se/forskola--skola/Forskola/forskolor/

Hûn dikarin bernameyên dersî yên pêşdibistanî di malpera saziya neteweyî ya perwerdeyê ya Swêdê bibînin: www.skolverket.se/undervisning/forskolan/laroplan-for-forskolan

**Bi xêr hatine li pêdibistanên şaredariya Sollentunayê!**

Di şaredariya Sollentunayê de armanca me hebûna baştirîn xwendingeh di Swêdê de ye. Em vê rêyê wek rêwîtiya xwendingehê bi nav dikin. Rêwitiya ku hema di dema pêşdibistanê de bi yekem xwendiniya zarokan dest pê dike. Dewreya pêşdibistanî yek ji girîngtirîn beşa perwerdehî û kemilîna zarokan e. Em di serê pêşî de di pêşdibistaniyê de dest bi xebata li ser şarezayiya zimanî ya zarokan dikin û zarokên we tevî zarokên din li jêr rêberiya mamostayên xwedîşiyan pêş dikevin û dikemilin. Pêşdibistanî dewreyeke girîng ji bo hemî zarokan e.
Di pêşdibistaniyê de, zarok divê hest bikin ku di cihekî hêmin û perwerdeyî de ne û tê de dikarin bikemilin û ruşd bikin û hesteke baş bi dest bihênin.

Soley Aksöz Lithborn (M), serokê komîsyona perwerdeyê;
Linda Ekstrand, serokê dayîreya nivîsgeha perwerdeyê

SOLLENTUNA
KOMMUN